

Çîroka Deh Xulama

Miruvek ji maleka xanedan çû bajêrekê dîr daku xu bi miranîê wergirit u vegerrête ve. Îna gazî kir her deh xulamêtu, u deh wezine [parêt asin yêtu demî] deynan def wan u gut: “Karê bazirganî pê bikin heta ez bihêm.”

Belê xelkê bajêrê wî serê wî ne divîan, îna hindek li dîv da virêkirin, daku bêjinê me ne vêt ev miruve bibîte paşa li ser me.

U demê vegerîaî u piştî paşayetî wergirtî, fermana her

deh xulama da, ewêtu deh wezine daîne wan, daku bizanît ka her êk ji wan çi ji bazirganî ya xu anînber kirî ye.

Yê êkê hat u gut, “Ey xudan, wezina te deh wezine anînber kir.”

Îna gutê, “Te karek baş kirî ye, ey xulamê qenc. Vêca çunku tu li ser piçekê destpak bûî, here bibe walîê deh bajêra.”

U yê dûê hat u gut, “Ey xudan, wezina te pênc wezine anînber kir.”

Îna ev çende gute wî jî, “Bibe walîê pênc bajêra.”

Paşî xulamê dî hat u gut, “Ey xudan, eve wezina te ye, ya ku min dinav dersukê da veşart. Ez ji te ditirsam, çunku tu miruvekê dîlrreq î. Tu wî tiştî dibî ewê te ne danayî. U tu wî tiştê didrî ewê te ne çandî.”

Îna gut, “Ji ber devê te ez dê te dadkim, ey xulamê xirab: Te dizanî ez miruvekî dîlrreq im, ez wî dibim yê min ne danayî. U wî tiştî didirîm yê min ne

çandî. Pa te buçî parêt min ne kirin di panqê da demê ez dihatim da anînberê jê bikim?”

U paşî gut ewêtu li wêrê rawestaî: “Wezinê jê bistînin u bidine xudanî deh wezina.”

Îna gutinê: “Ey xudan, ewî deh wezinêtu heyne.”

Îna gut, “Ez dibêjime we ewê hey dê hêş bu ête danê. U ewê çi ne bît hetayê hey jî dê jê ête standin. U dujminêtu min ewêtu ne divîan ez li ser wan bibim paşa, li vêrê bu min hazir kin u li ber çavêtu min ser jê kin.”

- Îsa (Mizgînîa Luqaî 19:12-27)

